

# ALSO

Arbeitslosenselbsthilfe Oldenburg e.V.  
Şêwirmendî li Bajarokê  
Vechta û Oldenburg  
Vechta: 015783420682  
Oldenburg: 017643 30 21 27  
www.also-beratung.de  
lk-beratung@also-zentrum.de



**Thema:** Alg II und qezencazêde heta 400 € (01.01.2016)

## Pêşpevcûn

**Gelek Kesên Perê Bêkarîyê (ALG II) distînin, bilez pêwîstî ya wan bi Perê zêde heye û ji derve yî ALG II jî divê wekîdin Pera bidest bixin. Bi Alikarîya Bingehîn 404 EUR ji bo Kesên bi tenê û Kesên bi Zarok, 364 EUR ji bo Heval û Jînheval di Civatekî mîna hevde, armanca fermî ya xuliqandina Pirtûka Zagonên Civakî. Beşa 2 (SGB II) jiyaneke hêja û layiqî Rumeta Mirov bixe bin garantîyê. Li gorî SGB II biryarê wê yî pêkanîne, divê Kesên Alîkarîyê distînin, ji wê Alîkarîyê Xarina xwe bikin, heqê Kehrebê bidin, ji bo tamîra tiştên biçûk, pê tev li Jîyana Çandî bibin, Meriva vexwewînin, heqê Dermana bidin, Cil û Berg bikin usw. Tecrube nîşan didin, ku ev ne gengaze. Pisporên Paritätischen Wohlfahrtsverbandes jî, ji lêkolînen xwe ghiştin wê encamê ku Alîkarîya bingehîn, têra tenê beşek ji van Pêwîstîyên Rojane dike. Ji bo gelek Kesa wek derfetekî sivik, Karê 400 EUR yan jî Karêkin (minijob) binav tê. Beşek ji vê Destkeftîyê zêde, dîsa li ser ALG II tê hesabandin.**

Di Beşên li jêrê em dixwazin, meşandina Kiryarê Zagonî bidin naskirin.

Wekî Prensîp li gorî § 11 Abs. 2 SGB II, qezenca heta 100 EUR nayên hesabandin. Ango Sazîya Kar nikare tiştêkî ji Qezenca heta 100 EUR qut bike. Bi vî 100 EUR divê hemû Mesrefa ji Destkeftîya were derxistin. Ango Mînak, Bilêt, heqê cilên Kar, Alavên Kar û ji bo versicherung ya Taybet (Alavên Malê).

Ger qezenc bi ser 100 EUR ket, ALG II 20% wê dide û yê mayî distîne. Bi gotînen din: Her serê 1 EUR ye ku bi ser 100 EUR kefiye, 20 Cent jê ji Kesê bêkar re dimîne.

Mînak: Jinek li Dikanekê Kar dike û mehane 300 EUR heq ji xwedîyê Dikanê distîne:

300 EUR	Qezencazêde
- 100 EUR	Destkeftîyê Bingehîn
= 200 EUR	Yê mayî

- 40 EUR	(20% Para Jinikê)
----------	-------------------

= 160 EUR	Beşa li ser Perê Bêkarîyê tê hesabandin.
-----------	--

Ji 300 EUR Destkeftîyê zêde 160 EUR tê kuştin û li ser perê Bêkarîyê tê hesabandin. 140 EUR (100 EUR Destkeftîyê bingehîn û 40 EUR Para Kesê Bêkar) tê stendin. Ev 140 EUR ji Kesê Bêkar re wek qezencekî zêde ye.

Nerînek li ser Liste ya li jêrê ya ji bo Qezenca zêde û hesabandina wê:

- A. Pîrbûna Qezencazêde
- B. Para ku ji Mirov re dimîne

A.	B.
50 EUR	50 EUR
100 EUR	100 EUR
120 EUR	104 EUR
150 EUR	110 EUR
200 EUR	120 EUR
250 EUR	130 EUR
300 EUR	140 EUR
350 EUR	150 EUR
400 EUR	160 EUR

Kesên Bêkar yê Perê Bêkarîyê distînin, divê Sazî ya Kar ji Kar û Qezenca xwe yî zêde haydar bikin, Da ku di pêşerojê de ev Perê bê hesibandin. Rayedar wê bixwazin bizanibin bê qezenca zêde çiqase. Ger Mehane ne heman qezenc bi dest bikeve, divê Sazîya Kar jê haydar be, da ku li gorî Destkeftîyê û qezenca rasktekîn bihesibîne.

**Tipp:** Ji bo hin Bêkara, dibe ku wusa baştir be, ger ji xwedîyê Kar Belgeya Qezencê bistînin. Belgeyên bi vî awayî dibe wekî Mamostê Werzîşê, Komên Werzîşê, wekî Şagirt li ba Aus- û Fortbildung û Karê Perwerdeyî û Pedagogî de bê hesibandin. Bi giştî girêdayî Karên li gorî § 3 Nr.26 Einkommenssteuergesetzes heta 2.400 EUR di Salê de Bêbac. Di Rewşê wusa de Destkeftîyê Bingehîn ji 100 EUR derî 200 EUR (§ 11b Abs. 2 S.3 SGB II). Ev 200 EUR ji Kesê Bêkar re dimîne. Tenê Beşek ji vê Qezencê zêdetir bi 80% li Alg II tê hesibandin. § 11 Abs. 3 ya SGB II ji 1.4.2011 derbas dibe 11.18/ 18a Agahdarîya Sazîyar Kar derheqê SGB II di Kiryara Tirmeh 2013).

## **ALSO – Şêwirmendî**

**Ji Kerema xwe berê xwe bidin Pelê zer ya ALSO-Infolyern yan jî bi rêka Email hevdîtinekê ji me bixwazin:**

**Ik-beratung@also-zentrum.de**

Gefördert durch:



Niedersächsisches Ministerium  
für Soziales, Gesundheit  
und Gleichstellung